

# TEVKURD'ê piştgirî da Ahmet Turk



NETKURD  
Aktuelbûn: 16:05 - 25/2/2009

**"Şertê yekemîn ewe ku kurd, bi zmanê xwe siyasetê bikin. Axaftina bi zmanê kurdî, ji bo siyaseta kurd, divê bibe helwesta stratejîk."**

TEVKURD'ê di heqê axaftina Hevserokê DTP-ê Ahmet Turk ya bi Kurdî ya di civîna gruba partiya xwe ya di parlamentoyê de daxuyanîyekê belav kir. Ev daxuyanî li jêr e:

Hevserokê DTPê Ahmet TURK, di 24-ê Sibata 2009-an de, li Parlamena Turkîyê, di civîna grûba partîya xwe de bi kurdî axaftinek kir.

Axaftina Ahmet Turk, (wek bûyera Leyla Zanayê nebe jî), di parlamena tirk de bû sebebê nerazîbûnên tund. Partî û parlamenterên sîstemê, Turk û DTPê ixbar kirin û dozgeran "dawetî wezîfê" kirin. Bê samîmîyetîya siyaseta tirk, carek din

Axaftina Ahmet TURK, "şoq" kir û dengveda. Xwiyaye ku ewê di qada siyasî de û li ser medyayê nîqaş hîna gelek dewam bikin.

Gotinên Ahmet TURK, yên pêşîya "sondxwarina parlamenan" ku, li ser pirsra rojnamevanan gotibû, "em hatine pirsgrêkan çareser bikin, ne ku 'şova/şovmenîyê' bikin", (ji şovê "axaftina Leyla Xanîmê ya bi kurdî" dihat qestkirin) hatin bi bîranîn. Herweha hilavêtina DTPê jî, weke "şov", "provakasyon" û "taktîkên" hilbijartinan tene şîrovekirin.

Rojên pêş ewê rastî û samîmîyeta DTPê bide test kirin.

Belê, qenaet ewe ku DTPê û parlamenterên wê heta nuha performanseke hêja; siyaseteke neteweyî, 'serbixwe', rast û rasyonel nîşan nedan e. Hêvî û daxwaz ewe ku DTP, weke partîyek kurd-Kurdîstanî tevbigere û bi xwe jî bibe partîyek 'serbixwe', sivil û plural-demokrat.

Em weke Tevgera Yekîtiya Neteweyî her ji bo pêşketin û yekîtiya navbera hemû hêz û alîyên kurda dixebitin. Ji wê bonê, tawrê rast ji kur û kê bê, emê piştgrîyê lêbikin.

Herweha derengî be jî, em helwesta Brêz TURK û DTPê di cîh de dibînin û piştgrîyê lêdikin. Hêvî û daxwaz dikin ku ev nebe helwesteke “taktîki” û “populîst”.

Bi vê wesîlê em bi bîrtînin û dubare dikin ku;

Ziman, hebûn û rûmeta mirov e. Asîmîlasyon, sûc e. Sûcê dijî mirovahîyê ye. Û, di hiqûqa mafên mirovan de weke “jenosîda spî” hatîye qebûl kirin.

Li kudera dunyayê û li dijî kê dibe bila bibe, li dijî asîmîlasyonê derketin û parastina mafê zmanê zikmakî, yek ji şertên demokratîyetê yê sereke ye.

Yên ne kurd, dikarin mafê axaftin, weşan û perwerda zmanê dayîkê ji bo kurda biparêz in. Belê kurd, divê ne bi tenê dawa mafê zman xwe bikin, herweha fiilen vî mafî bikar jî bînin.

Bi kurdî axaftin, xwendin, nivîsandin û jîyan, haleke pir tabîîye.

Şertê yekemîn ewe ku kurd, bi zmanê xwe siyasetê bikin. Axaftina bi zmanê kurdî, ji bo siyaseta kurd, divê bibe helwesta stratejîk.

25 Sibat 2009- Dîyarbekir

**TEVKURD**

**(Tevgera Yekîtiya Neteweyî ya Kurd)**